
Bê dirave

# MIZGÎN

15 - Sibat - 2026 Hejmara - 201



# Naverok


1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn



Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn -Şêwekar
Baran zagros


Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Kovara Mazgîn
Kovara Mazgîn

# Ji bo xêzkirina mirîşkê gavên li jêr bişopîne

## اِتبَعِ الخَطَوَاتِ التَّالِيةَ لِرَسْمِ الدَّجاجةِ



# MAMOSTA

**Mam mam mamosta**

**Jîr û zana û hosta**

**Pênûs dest de rawesta**
**Hingî wî got newesta**

**Dersa wî ya helbesta**
**Zû datîne helwesta**

**Pirtûka wî ser desta**
**Ronî dike lew hesta**

**Mamosta şîr û şekir**
**Deryê serya wî vekir**

**Mamosta rast û rûken**
**Dersê nade ew bêken**

**Mamostayê zor leheng**
**Xwendevanên pir çeleng**

**Dibistana reng û reng**
**Dibe cejn û şox û şeng**

**Diyar Bohtî**



# Lawiran bighîne jîngeha ku lê dijîn

مِلْ بينَ الحَيوانِ والبيئةِ التي يعيشُ فيها


















# Efrîn

Bajarê Efrînê yek ji bajarên Rojavayê Kurdistanê ye, li .herêma Çiyayê Kurmênc li ser beravên Çemê Efrînê ye Ew li bakur-rojavayê Helebê ye û 60 km dorî wê ye. Ew herêmeke çiyayî ya kesk e, bi darên xwe yên zeytûn, mezrayî û belavbûna rezên tirî navdar e. Şînatî û darên merxê yên wekî çam û berû jî lê pir in. Herwiha Lûtkeya wê ya herî bilind Çiyayê Girê Mazin e, ew jî beşek ji rêzeçiyayên .Torosê ye
Efrîn cihên arkeolojîk ên girîng dihewîne, ji ber ku ji demên kevnar ve mirov lê niştecih bûye. Ji şûnewarên wê jî: keleha .Semian, keleha Hûrî, deşta Êyn Darê û pira Herhidrayê
Piraniya niştecihên Efrînê Kurd in, ew bi cilên xwe yên gelêrî û stranên xwe yên xweş têne naskirin. Ji sala 2018'an ve ew ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin û heta roja .îro jî di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de ye

# عفرين

مدينةُ عفرينَ واحدةٌ من مدن كُردستان؛ "روجِ آفا"، تقعُ في منطقة Çiyay� Kurm�nc وتمتدُّ على ضِفتيّ نهرِ عفرينَ.
تبعدُ عن مدينةِ حلبَ 60 كلم، إلى الشّمالِ الغربيِّ، وهي منطقةٌ جبليَّةٌ خضراءُ، تشتهرُ بأشجارِ الزَّيتونِ والحِمضيَّات، وانتشارِ الكُرومِ فيها، وفيها غِطاءٌ نَباتيٌّ، حراجيٌّ، منتشرةٌ فيه بكثرةٍ أشجارُ الصَّنوبرِ، والسَّرْو.
وفيها أعلى قمَّةٍ، هيَ جبلُ Gir� Mazin الذي يعد جزءا من سلسةِ جبالِ طُوروسَ.
وفي عفرينَ مواقعُ أثريَّةٌ هامَّةٌ، فقد كانت عفرينُ موطنًا للإنسانِ منذُ أقدمِ العصورِ. ومن هذهِ الآثارِ: قلعةُ سمعانَ، وقلعةُ هوري، وتلُّ عينِ داره، وجسرُ هرهدره.
معظم سكانِ عفرينَ من الكُرْدِ، الذينَ يتميَّزون بأزيائِهم، وبأغانيهم المعبِّرةِ الجميلةِ. وقد احتلتها الدولة التركية منذ عام 2018 ولا تزال محتلة حتى الآن.




# Tu dizanî

## هلْ تعلَم

**Esmanger li fezayê cilên taybet ku alîkariya wan di bêhindayînê de dike li xwe dikin, ji ber ku li fezayê hewa tune ye.**

**أنَّ روَّادَ الفضاءِ يرتدونَ بدلاتٍ خاصةً تساعدُهم على التَّنفُّسِ في الفضاءِ؛ لأنَّه لا يوجدُ هواءٌ في الفضاءِ.**



**Herwiha em nikarin li fezayê dengan bibihîzin, ji ber ku eger hewa tune be deng nayên veguhestin.**

**ولا نستطيعُ سماعَ الأصواتِ هناك؛ لأنَّ الصَّوتَ لا ينتقلُ دونَ هواءٍ.**



# Roja sibehê


## Hevala tenduristiya te ye

# شمسُ الصَّباحِ

## صديقةُ صحتِكَ

**Tu dizanî ku her roj, roj diyariyekê dide te? Ew bi çav nayê dîtin, lê ew hêzê dide laşê me, enerjî û çalakbûnê jî dide me. Ev diyarî V îtamîna D ye.**

**هل تعلمُ أنَّ الشَّمسَ تُعطيكَ كلَّ يومٍ هديَّةً؟ لا تُرى بالعينِ، لكنَّها تعطي القوة لأجسادنَا، وتُعطينا طاقة ونشاطا، هذهِ الهديَّةُ فيتامينُ د.**






### Çima pêwîstiya me bi vîtamîna D heye?
### لماذا نحتاجُ ضوءَ الشَّمسِ؟


**Ji ber ku vîtamîna D alîkariya hestiyên me dike ku xurt bibin, Ew hestê kêfxweşî û rehetiyê dide me, Pirgala parastinê xurt dike.**

**لأنَّ فيتامينَ د يساعدُ عظامَنا على النُّموِّ بقوَّةٍ, ويُعطينا شعورًا بالسَّعادةِ والرَّاحةِ, ويقوّي مناعتَنا، فنُصبحَ أقلَّ عُرضةً للمرضِ.**

# حُرُوفٌ وكَلماتٌ

# Tîp û gotin

أصْدقائِي الأعزاءَ، أكملُوا الحَروفَ النَّاقِصةَ؛ لتُكملُوا الأسماءَ حَسَبَ صُوَرِهَا



# Meryem Xan

# مريمُ خان



Ew di sala 1904'an de li Şirnexê li Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, ji ber şert û mercên dijwar ew tevî malbata xwe koçî bajarê Qamişlobûn, li Qamişlo ji ber dengê wê yê xweş  ew tevlî dîwana stranbêjan bû. Piştre ew çû bajarê Zaxo yê Başûrê Kurdistanê û paşê çû Mûsilê, li wir ew rastî stranbêjên navdar yên wek: Mihemed Arif Cezrawî, Hesen Cezrawî û Nesrîn Şirnexî, hat.
Di sala 1939'an de wê weke dengbêj li radyoya Bexdayê kar kir, gelek stranên wê hatin weşandin û jimara wan gihişt zêdeyî 200 stranan, ji wan: Ay delal, Sêvê û Hecî, Lê lê wesê, Çemê Bişêrîkê, Dotmam.
Meyrem Xan di sala 1949'an de li Bexdayê koça dawî kir û gencîneyek ji muzîka Kurdî ya cihêreng li pey xwe hişt.

وُلِدت سنةَ 1904 في شرناخ بباكور كردستان، وبسببِ الظروف القاسية؛ هجرت مع عائلِتها إلى مدينةِ قامشلو، وانضمَّت إلى ديوانِ المغنيين؛ نتيجة صوتَها جميلٌ.
ثمَّ سافرتْ إلى مدينةِ زاخو بباشور كردستان، ثمَّ إلى المُوصلِ، وهناك تعرفَّت على مطربينَ مشهورينَ في الغِناءِ، مثل: محمد عارف جزراوي، وحسن جزراوي، ونسرين شرنخي.
و في سنةِ 1939 عملتْ مطربةً في إذاعة "بغدادَ"، وأُذِيعتْ لها الكثيرُ من الأغاني، حتَّى وصلتْ إلى أكثرِ من 200 أغنية، منها: Ay delal. Sêvê û Hecî. Lê lê wesê. Çemê bişêrîkê. Dotmam
تُوفِّيتْ في بغدادَ بالعراق، عام 1949م، تاركةً كنزًا منَ الموسيقا الكُرديَّةِ الخالدةِ والمميَّزةِ.

# Bexçeyê Navan

Nargul Nûdem

Nîvîn Nermîn

Nûbar Navcan

## Em ê çawa jîngeha xwe di zivistanê de biparêzin?

Hevalên min, di zivistanê de dûyê ji sobeyên germkirinê yên li mal û dibistanan bi  qaseyên mezin dikeve atmosferê û dibe sedema qirêjiya hewayê.

Ji ber vê yekê, em çawa di zivistanê de jîngeha xwe ji wê biparêzin?
-Dema roj hebe em perdeyan vekin da ku ji germa rojê sûd werbigirin.
Em cilên germ li xwe bikin, ev yek tendirustiya me diparêze.
Divê em Şewitandina bermayiyan kêm bikin, ji ber ku dûyê wan hewayê qirêj dike.

## كيفَ نُحافظُ على بيئتِنا فِي الشِّتاءِ؟

أصدقائِي، في الشِّتاءِ يُطلَقُ دُخَانُ المدافِئِ منَ المنازلِ والمدارسِ بكَثرةٍ في الفضَاءِ، فَيُسبِّبَ تلوُّثَ الهواءِ في الجوِّ.

لذلكَ لِنحْمِي بيئَتنا في الشِّتاءِ منهُ؟
ـ نفتحُ السَّتائرَ نهارًا للاستفادةِ من حرارةِ الشَّمسِ الدَّافئةِ.
ـ نرتدي ملابسَ دافِئَةً، وهذَا يُحافظُ على صحَّتنا!
وعلينا التَّقليلُ من حرقِ النِّفايَاتِ؛ لأنَّ دُخَانَها يلوِّثُ الهواءَ الذي نتنفسُهُ.



Navê min Ciwan Dilşad Hecî Îsmaîl e, ez neh salî me û li Dibistana Şehîd Salih Yûnis di refa sêyemîn de dixwînim. Ez ji lîstika kaba rûbîk pir hez dikim! Ev jêhatiya min di refa yekem de dest pê kir û malbata min her gav min teşwîqî xwendinê kiriye.
Ez li peymangeha Amûdê a zimanan fêrî sirên kaba rubik bûm, min xwe perwerde kir heta ku ez tê de serkeftî bûm. Ez beşdarî pêşbirkek taybet a Kuba Rubik bûm û min encamên pir baş bi dest xist, ji ber wê ez kefxweş û serbilind bûm. Ez xeyal dikim ku beşdarî pêşbirkên mezintir bibim û zarokan fêr bikim ku çawa bi vê lîstika ecêb kêfxweş bibin.

أنا جوان دلشاد حجّي إسماعيل، عمري تسعُ سِنواتٍ، وأدرسُ في مدرسةِ الشَّهيدِ صالح يونس في الصَّفِّ الثَّالثِ الابتدائيِّ. أحبُّ لُعبةَ الروبيك كثيرًا! بدأتْ هُوايتي منذ الصَّفِّ الأوَّلِ، وكانتْ أسرتي دائمًا تشجِّعُني للتَّعليم.
تعلّمتُ أسرارَ الروبيك في معهدِ عامودا لُّلغاتِ، وتدرَّبتُ حتَّى أتقنتُ اللُّعبةَ. فشاركتُ في مسابقةٍ خاصّةٍ بالروبيك، وحقَّقْتُ نتائجَ رائعةً؛ جعلتني فخورًا وسعيدًا جدًّا. أحلمُ أنْ أشاركَ في مسابقاتٍ أكبرَ، وأنْ أعلّمَ الأطفالَ كيفَ يستمتعونَ بهذهِ اللُّعبةِ المُدهشةِ.




# Ciwan Dilşad
# جوان دلشاد


# Em kulîlikekê biçînin




Ez ê niha biçînim, belkî surprîz zû were, wekî dapîrê min gotî.
Hahahah..... Di zivistanê de? Her tişt di bin vê sermayê de radizê.
Çiqas Evîn serhişke...Tov di vê sermayê de qet şîn nabin.


Binêre Kamîran...Tişte k biçûk û kesk heye
Silav ...Îsal ez yekem şînatî me.
Şînatî diaxive?!!!
Erê! Ji bo ez ji wer bêjim hêvî sermayê nas nake
Wa surprîza destpêka biharê xuya kir…
Kulîlika ku ji baran û qeşayê natirse.


Tu yê bibî kulîlika min... Ez ê her roj li te miqate bim
Ez ê her roj bînim bîra we ku germahî ne tenê ji rojê tê...Ew ji dilê hevalan jî tê.
Evîn ez ê te tenê nehêlim, pêwîstiya hêviyê bi karekî hevkar heye
Sibe destpêka Adarê ye, wê destpêka bihareke pir xweşik be.



**Çeydan**

إِبْرِيْقٌ

**Pitcher**



**Peyal**

كَأْسٌ

**Glass**




**Şûşe**

قِنِّيْنَةٌ

**Bottle**



**Fincan**

فُنْجَانٌ

**Cup**

# Çavika Mizgîn

## عدسة مزكين



مجاناً

العدد - 201

# مزكين

15 - شباط- 2026

